

# nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat


Hejmar: 12

Sal: 1

Îlon 1993

Biha: 15.000 TL

## Saleke pir bi bereket



# ALFABEYÊN LATÎNÎ Û ERE BÎ YÊN KURDÎ

LATÎNÎ	MÎNAK	TIRKÎ	ERE BÎ	MÎNAK
A a	Ard	Un	ئا ، ا	ئارد
B b	Baş	İyi	ب	باش
C c	Ceger	Çiğer	ج	جەگەر
Ç ç	Çav	Göz	چ	چاڤ
D d	Dil	Gönül	د	دل
E e	Ewr	Bulut	ئە ، ه	ئەور
Ê ê	Êş	Acı, sızı	ئێ ، ی	ئێش
F f	Fêkî	Meyve	ف	فینکی
G g	Gund	Köy	گ	گوند
H h	Hingiv	Bal	ه	هنگف
I i	Ixlamûr	Ihlamur	ئ ، -	ئخلامور
Î î	În	Cuma	ئێ ، ی	ئین
J j	Jin	Kadın	ژ	ژن
K k	Kulîlk	Çiçek	ک	کولیلک
L l	Lale	Lale	ل	لاله
M m	Mam	Amca	م	مام
N n	Nan	Ekmek	ن	نان
O o	Oflaz	Sevimli	ئو ، و	ئوفلاز
P p	Paçik	Çaput	پ	پاچک
Q q	Qesr	Saray	ق	قەسر
R r	Rojhilat	Doğu	ر	رۆژھلات
S s	Serok	Başkan	س	سەرۆک
Ş ş	Şil	Islak	ش	شل
T t	Tenik	İnce	ت	تەنک
U u	Unîversîte	Üniversite	ئو ، و	ئونیڤەرسیتە
Û û	Ûlema	Ülema	ئوو ، وو	ئوولەما
V v	Vexwarin	İçmek	ڤ	ڤەخوارن
W w	Wezîr	Bakan, vezir	و	وەزیر
X x	Xelat	Armağan	خ	خەلات
Y y	Yezdan	Tanrı	ی	یەزدان
Z z	Zava	Damat	ز	زافا

# Nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat

Kızıtaşı Cad. Kuriş Apt. 51/3  
Fatih-Istanbul  
Tel: 533 75 88 Faks: 524 00 38

Xwedî  
(Sahibi)  
MAHMUT YARLUĞ

Berpirsiyarê Giştî  
(Genel Yayın Yönetmeni)  
SABAH KARA

Berpirsiyarê Nivîsaran  
(Sorumlu Yazışleri Müdürü)  
SÜLEYMAN ÇEVİK

Mudîrê Tîprêzî û Arşîvê  
(Dizgi ve Arşiv Müdürü)  
ALI KARADENİZ

Muşawirê Nivîsaran  
(Yayın Danışmanı)  
MUSTAFA GOYANI

Nûbihar kovareke mehanî ye ku bi weşandina karpêkên çanda Kurdî bi mana tevayî dilebîke. Raman û rayên xwedyên karpêkan, lizûmen ne raman û rayên Nûbihar in. Nivîsarên ku bi înzeya Berpirsiyarê Giştî weya bi navê Nûbihar tên weşandin raman û raya me nîşan didin. Nûbihar di serrastkirina karpêkên şandî de azad e.

BEDELA ABONETIYA SALINÎ:

Lî hundir: 180.000 TL

Lî derve: 60 DM

JIMAREYÊN HESABÊ:

Lî hundir: Postgiro (Posta Çeki):

Süleyman Çevik, 658265

Lî derve: Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100-3118770

Tîprêzî (Dizgi):  
Nûbihar

Berg (Kapak):  
Dönüş

Çapxane (Matbaa):  
Mutlu Ofset

## Naverok

NÛBIHAR: MA HUN DIXWAZIN NÛBIHAR  
VEMIRE? .....3

SABAH KARA: SALEKE PIR BI  
BEREKETI! .....5

NURETTİN DURMAN / HOZAN OFLAZ:  
FERMAN .....11

SÜLEYMAN ÇEVİK: Dİ YEKSA LIYA  
XWE DE NÛBIHAR Û ROLA WÊ .....12

SABAH KARA: NAMEYÊN  
BÊCEWAB / 13 .....14

ALİ KARADENİZ: ÇIRA VÊKETÎ,  
BIKIN MEŞALE .....15

MELA QASIM: NUQURÇ / 5 .....17

YÛNIS EMRE / HOZAN OFLAZ: EV  
DINYA GEPEK NAN E .....17

HAYRULLAH ACAR: NÛBIHAR:  
ŞEREF Û RÛMETA MISLIMANAN .....18

MUHAMMED PAŞA: VILÎ ABYAY  
ÇIMAN DE MI DI .....20

MUHAMMED PAŞA: HERBÊ MA .....20

ŞUKRULLAH YILDIZ: BIRATIYA ME Û  
TIRKAN, BI ÎNKARA GEL DOM DIKE .....21

RAÎF BÊÇARE: BÊÇARE .....22

ABDILLAH AMEDÎ: NIHÊRTINA  
PÊXEMBER DE DÊ Û BAV .....23

MISTEFA MEMITÎ: MA EV ÇAWA BIRATÎ  
YE? .....24

FERHENGOK .....26

NAVEROKA SALA YEKEMÎN .....27



# MA HUN DIXWAZIN NÛBIHAR VEMIRE?

**B**i vê hejmara me, sala me ya ewil qediya. Me duwazdeh hejmarên yek ji ya din çêtir weşandin. Me nîşan da ku kurdên misliman ên îroyîn jî li ziman û çanda xwe xwedî derdikevin. Me jî nîşan da ku meriv kare bi zimanê kurdî maqale, helbest, qise, çîrok û hwd binvîse û biweşîne.

Di vê riyê de xwendevanên me jî em tenê nehiştin. Gellek ji nameyên ku me di kovarê de weşandin, bi mehan li benda dora xwe ya weşandinê man. Lewra ji me re pir name hatin.

Heta ji destê me hat, me xwestinên xwendevanên xwe li ber çavan girt. Me cehd kir ku em hemû xwestinên maqûl ên heval û hogirên xwe pêk bînin.

Hinin ji xwestinan, ji me zêdetir bûn ku em bikaribin bînin cih. Hinin ji wan jî, ji ber ku ne maqûl bûn, me pêk neanîn. Lêhema em karin bibêjin ku, em bi xwendevanên xwe re bûne ekîbeke qenc û em pir li hev hatin. Em bawerin ku wê ev hal heta talî jî bidome.

## Êdî ev barê giran hêdî hêdî dike zora me bibe

Xwendevanên hêja!

Ev salek e em bi zehmetiyên herî zêde vê kovarê didomînin.

Ev bar, bareke pir giran e.

Digel vê qasê ku weşandina kovareke xwerû bi kurdî têra xwe zehmet e, lêbelê barê malî û aborî, bareke hê jî girantir e.

Heta niha me ne xwest em zêde şikayetê bikin. Lêbelê êdî kêr gihîste hestî.

Êdî bila xwendevanên me bizanibin ku halê me yê malî û aborî ne baş e.

Hun nizanin, hema me dikir em piştî hejmara duwazdehan, weşandina kovarê bisekinîn. Lê me nikarî. Lewra dilê me razî nehat ku em vê sipehîtiyê ji holê rakin.

Heta ji destê me bê, em ê weşandina kovarê bidomîn. Lê gereke em hemû pevre fedakariyê bikin. Fedakariya ku gereke em bikin, me kiriye û em dikin. Lê em li benda we ne ku hun jî fedakariyê bikin, hun muheqqeq ji kovara xwe re abone û bayiyên nû peyda bikin û bayiyên teşwîq bikin ku deynê xwe zû rêbikin.

Hevalno! Lutfen jibîr nekin ku sekinandina Nûbihar, mesûliyeteke pir mezin e. Werin da ku em di bin vê mesûliyetê de nemînin, em tev de mesûliyeta xwe bînin cih û em nebin qatilê Nûbihar a delal.



## Abonetiya xwe nû bikin

Ên ku wê bi vê hejmarê abonetiya wan bigede, gereke abonetiya xwe nû bikin. Ji bona vî karî jî, gereke 180.000 TL li postgiro (:postaçeki) ya me razinin û maqbûzê bişînin navnîşana me. Jimareya postgiroyê; Süleyman Çevik, 658265 e. Lêbelê ev yek jî gereke neye jibîrkirin: Li ser maqbûza ku hun ê bişînin, binvîsin ku wê abonetiya we ji kîja hejmarê dest pê bike.

Di xweşiyê de bin.

# KITÊBÊN EM BELAV DIKIN

## (DAĞITIMINI YAPTIĞIMIZ KİTAPLAR)

### Kitêbên Kurdî (Kürtçe Kitaplar)

1- Doza Jîn / Hiseyn Eli Başar.....	15.000.-
2- Ferheng (Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî) / D. İzoli.....	195.000.-
3- Ferheng (Zazakî-Tirkî) / Malmisanîj.....	100.000.-
4- Mamoste Seîdê Norsî (Sorani, bi tîpên Erebî).....	40.000.-
5- Mewlûd / Mele Ehmedê Bateyî.....	30.000.-
6- Nalînên Min / M. Şakirê Koçer.....	10.000.-
7- Nimêj Dikim / Komîsyon (Kuşe).....	35.000.-
8- Nimêj Dikim / Komîsyon (Spî).....	30.000.-
9- Nûbar / Ehmedê Xanî.....	20.000.-
10-Peyiva Bîst û Sêyemîn (23. Söz).....	15.000.-
11-Peyivên Piçûk (Küçük Sözler).....	20.000.-
12-Rîsala Biratiyê (Uhuwvet Risalesi).....	15.000.-
13-Rîsala Biratiyê (Bi tîpên Erebî).....	15.000.-
14-Baran / A.Qadir Botan.....	10.000.-

### Kitêbên Tirkî (Türkçe Kitaplar)

1- Aydınlik ve Dindarlık / A. Suruş.....	15.000.-
2- Ayet Yorumları / A. Şeriatî.....	25.000.-
3- Dini Düşüncenin Yeniden Kurulması / A. Suruş.....	15.000.-
4- İlerici Gericilik / A. Suruş.....	10.000.-
5- İslam Ümmetinin Yetimleri Kürtler / F. Şinnavî.....	15.000.-
6- Kürt Soruşturması / Sor Yayınları.....	40.000.-
7- Peygamberler Aydınların Önderleri / A. Suruş.....	15.000.-
8- Şırnak Baskını / Osman Resulan.....	20.000.-
9- Zamanın Zeynebi / Z. Burucerdî.....	15.000.-

### Kitêbên Erebî (Arapça Kitaplar)

1- Lemalar (el-Leme'at).....	100.000.-
2- Mektubat (el-Mektûbat).....	100.000.-
3- Sözlür (el-Kelimat).....	120.000.-

*Kitêbên li jor, bi bîst ji sedî (20 %) erzanî têne şandin. Yên ku hun dixwezî, bihaya wan hesab bikin, ji mecmûa bihayê, 20 % kêmbikin, baqiyê li hesabê jêrê razînin û fotokopiyeke pela razandinê, bi mektûba xwe ya ku we navê kitêban tê de nivisandîye, bişînin navnîşana kovara me.*

(Yukarıdaki kitaplar % 20 indirimle gönderilir. İstediklerinizin tutarlarını hesaplayın, toplamdan % 20 düşün, geriye kalan tutarı aşağıdaki hesaba yatırın ve ücreti yatırdığınızı gösteren belgenin fotokopisini, istediğiniz kitapların isimlerini ihtiva eden mektupla birlikte dergimizin adresine gönderin.)

### JIMAREYÊN HESABÊ (HESAP NUMARALARI):

Li hundir (Yurt içi): Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

Li derve (Yurt dışı): Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100-3118770

### NAVNÎŞAN (ADRES):

Nûbihar, Kızıtaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3, Fatih / İstanbul

Tel: 533 75 88 Faks: 524 00 38

# SALEKE PIR BI BEREKET!

**K**ovara me Nûbihar bi derhatina xwe ve kêmasiyeke herî mezin ji holê rakir.

Dema ku me dest bi kar kir, biryara me ev bû ku em di her hejmara xwe de, ji hejmar an hejmarên berê bipêşdetir bikevin û hejmara me ya nû, ji hêla naverok û teknîkê, tim î tim ji hejmar an hejmarên me yî berê çêtir be.

Li gor vê biryarê, Nûbihar di sala ewil a jiyana xwe de, her meh li ser pirseke muhîm sekinî û ramana xwe ya di heqê wê pirsê de diyar û îlan kir.

Ji ber ku wê sala me ya ewil bi vê hejmarê temam bibe, ez dixwazim vegerim hejmarên me yê derketî û ji îro li doh binihêrim, da ku em mesafa ku me bihurandiye cardin li ber çavên xwe xuya bikin.

## 1. Ne zalim be, ne mazlûm!

Manşêta hejmara me ya ewilîn, “Ne zalim be, ne mazlûm!” bû.

Mazlûmbûn û redkirina mazlûmiyeta xwe, ne kafî ye. Gereke dema ku me xwest em mazlûmiyeta xwe ji holê rakin û ji bin barê zilmê derkevin, em bi xwe

jî zilmê li kesî nekin. Lewra heta ku em jî zalim bin, ti heqê me tineye ku em ji zilmê şikayetê bikin. Heta em aş in, zalim qeraş in. Em misteheqî çî bin, wî dibînin. Naxwe yê ku dixwazin ji zilmê xelas bibin, gereke him ne zalim bin û him jî ne mazlûm!



## 2. Nezanî bindestî ye, zanîn rizgarî ye!

Manşêta hejmara me ya duyemîn, “Nezanî bindestî ye, zanîn rizgarî ye!” bû.

Kesên nezan, tim bindest in. Lewra tiştê ku mesûliyeta meriv bi wî hîn dide, zanîn e. Dema meriv nizanibe ku, xwe ji bin zilmê derêxistin mesûliyetê

ke însanî ye, meriv nikare li ber zilmê bisekine û bi zaliman re bicenge. Loma riya rizgariyê, ji zanîne dibihure. Naxwe nezanî bindestî ye, zanîn rizgarî ye!

## 3. Bibêje “Na!”

Manşêta hejmara me ya seyemîn, “Bibêje “Na!” bû.

Weke ku teyr bi du baskan difirin, meriv jî bi du berpêyî û reaksiyonan ve jiyana xwe didomînin: “Erê” û “Na”!

Meriv di jiyana xwe de gereke tiştina

Meriv di jiyana xwe de gereke tiştina qebûl û tiştina jî red bike.

Bêyî qebûlkirina rastî û qenciyan û redkirina nerastî û neqenciyan, meriv nikare jiyaneke birûmet bidomîne.

Merivê ku ji her tiştî re dibêje “Erê”, weke teyrê ku bixwaze bi baskekî tenê bifire ye.

Em dibînin ku îro mirovên me ji “Erê” zêdetir îstîfade dikin.

Yên ku histoyê xwe li ber zilmê xar dikin, ji yê ne wisa pirtir in. Lêbelê diyar e ku îro îhtiyaca me bi “Na”, ji “Erê” zêdetir e. Loma me di wê hejmara xwe de gelê xwe dawet kir ku bibêjin “Na!”

#### 4. “Pirsgirêka kurdan”

Manşêta hejmara me ya çaremîn, “Pirsgirêka kurdan” bû.

Helbettê diyar e ku em bi xwe, kurdan “pirsgirêk” nahesibînin. Loma me “Pirsgirêka kurdan” di nava dunikan de nivî-



siye. Lêbelê hinin me kurdan “pirsgirêk” dihesibînin.



Me xwest em di wê hejmara xwe de ser vê pirsê hûrnihiyê bikin ku ka ev pirs çî ye û çawa derketiyê holê? Û me ji wê hejmara xwe û pê de ser vê pirsê lêpirsînekê tertîb kir.


#### 5. Pirsgirêka Bosna: Zalim yek millet in, mazlûm yek millet!

Manşêta hejmara me ya pêncemîn, “Pirsgirêka Bosna: Zalim yek millet in, mazlûm yek millet!” bû.

Weke ku hûn zanin, li mislimanên Bosna'yê zalimî û bêbextiyeke pir mezin hatiye kirin.

Zilma li Bosna'yê hatiye kirin, bi hemû dinyayê nîşan da ku zalim yek millet in. Naxwe gereke mazlûm jî bibine yek û li hember zilm û bêbextî û hêserefiyê bi hev re hereket bikin, destê hev bigrin û arîkariya hevûdu bikin.





Helbettê diyar e ku di facîa Bosna'yê de dersek din jî xusûsen ji me mislimanan re heye. Ev dersa herî girîng ev e:

Ne mumkin e ku gawir bibine dostê me!

Heger em dixwazin bi gawirên wehşî re di dinyakê de bijîn, gereke tim î tim doqikên me afîkî de li benda me bin. Ne ji bona zilmkirinê, lêbelê ji bona xwe muhafezekirinê. Lewra çawa ku meriv nikare bi gurên har re pev re bije û gereke li gor wî halî haziriya xwe bike, wisa jî, meriv nikare bêtedbîr bi gawirên har re di dinyakê de bije.

Ma hatiye jibîrkin ku dema xaçiyên wehşî Quds a ezîz îşxal kirin, ne tenê misliman û cihûyan, lêbelê fileyên ku ne ji mezhebê wan bûn jî dane ber şûran.

Lê ma gelo Selaheddîn wisa kir?

Weke hemû دنیا û alem zane, Selaheddîn ji eskerên xwe re wisa got: "Kesê ku sîlah di dest de nebe û bi we re nencege, zîhar nekujin!"

Ma ti mirovê birûmet kare bi raheû jin û zarokan bikuje û wan tiştên ku sirbên har tetbîq kirin, pêk bîne?

Bi tenê mirovên birûmet in ku ji bona arîkariya wî, eslen dînê mazlûm napirsin û eynen wisa jî, ji bona redkirina wî, dînê zalim jî napirsin.

Zalim ji kîja dînê be, gereke em dijmînê wî bin; çî ji dînê me, çî ji dînek din. Û mazlûm ji kîja dînê be, gereke em heval û hogirê wî bin; çî ji dînê me, çî ji dînek din.

Ev şeref gereke ya me be; lewra em ummeta xêrê ne ku Xweda ji bona vê yekê me kiriye ummetek û vî barê birûmet daye ser milê me.

## 6. Îda Remezanê û cejna Newrûzê pîroz bin!

Tu li hin ji mislimanên kurd dinihêrî, tim îdên dînê pîroz dikin, lêbelê evana îd û cejnên millî û civakî weke mixalifê îslamê dibînin û eslen naxwazin qala wan bikin. Lêhema ji aliyê din ve em dibînin ku di dîroka me de hinek ji van cejn û îdan tim î tim di nav mislimanan de hatine pîrozkirin; ku yek ji wan jî Newrûz e.

Li hember vê yekê, hin mirov jî tê bê



qey gelê me eslen îdên dînî pîroz nake, qet ehemmiyetê nadin van îdan, tim î tim îdên millî û civakî pîroz dikin û guh nadin îdên dînî yên ku ev sedsalan in gelê me wan ji dil û can pîroz dike.

Ji ber ku bi baweriya me herdu radan jî xelet in, bi munasebeta îda Remezanê û cejna Newrûzê ku herdu di mehekê de lihev hatin, me manşêta hejmara xwe ya şeşemîn kir "Îda Remezanê û cejna Newrûzê pîroz bin!" û me herduyan pev re pîroz kir.

### 7. Tevkujiya Helebçe jibîr nekin!

Manşêta hejmara me ya heftemîn, "Tevkujiya Helebçe jibîr nekin!" bû.

Me xwest em di wê hejmara xwe de tevkujiya nemirovane ya Helebçe, ya ku bi sîlahên kîmyewî zêdetir ji pênc hezar kurd ên pîremêr û pîrejîn û mêr û jin û zarok tê de hatin qetilkirin, yad bikin û bi xwendevanên xwe hişdar bidin ku vê tevkujiyê jibîr nekin û xebat bikin de ku cardin tevkujiyek mîna vê neye serê me.

### 8. Dar li ser kokê xwe hêşîn dibin,

### mirov li ser zimanê xwe!


Çawa dar bêkok nabin û li ser kokê xwe hêşîn dibin, millet jî nikarin bê ziman bin û ew jî li ser zimanê xwe şîn tên. Loma tarîxa medeniyetan, ji cîhetekê tarîxa zimanan e. Lewra medeniyet li ser ziman û karpêkên zimanî, weke kîtabe û kitêb û kovaran bilind dibe û di dîrokê de bê zimanêke bipêşdeçûyî, ti medeniyet pêk nehate.

Naxwe bê şik, bipêşdeçûna kurdan jî bi zimanê wan ve bi şida girêdayî ye û heta zimanêke qewî pêk neye, medeniyeteke qewî jî pêk naye û kurd ji vê perîşaniyê xelas nabin.

Loma me manşêta hejmara xwe ya heştemîn kir "Dar li ser kokê xwe hêşîn dibin, mirov li ser zimanê xwe!"

### 9. Yekitî fedakariyê dixwaze!

Herkes peywîstî û lizûma yekitî û hevgerîna hêz û grûbên kurd û hemû mazlûman zane. Bê şik, ti şexsê birûmet nikare vê peywîstiyê red bike. Hewcedariya bi yekitiyê, ne qabil î redkirinê ye.



Her kes zane, pir tişt hene ku bêyî yekitî û hevgirtineke bi şîda, ew bidest nayin. Lêbelê bila bidestanîna tiştina li dera ha be, neyekbûn û hevnegirtin bi xwe jî, bela û astengiyeke pir mezin e.

Yanê em ji du aliyan ve hewcedar î yekitiyê ne.

Him ji bona ku em nebin maniê hevûdu, em hewcedarê yekitiyê ne û him jî ji bona ku em bikaribin tiştina pêk bînin, em hewcedar in.

Ez bawer im ku her kes vê heqîqetê zane.

Baş e, lê naxwe çima yekitî têra xwe pêk naye?

Em dibînin ku hemû kes û civak bi yekitî û hevgirtinê îlan î eşq dîkin, yekitî û hevgirtinê dixwazin; lêbelê yekitî cardin jî bi heddê kafî pêk naye.

Çima?

Sebeb pir in. Lê bi baweriya min esas sebeb ev e ku kes û civakên me ne hazir in ku ew bi xwe fedakariyê bikin û tim î tim fedakariyê ji dîgeran dixwazin. Ew bi xwe naxwazin ku bal kesê din ve hebin, lêbelê dixwazin ku her kes bal wan


ve biçê. Naxwazin di teleb û xwestên xwe de musamehekar û bitolerans bin, lêbelê dixwazin ku her kes bi musamehe û tolerans li wan binihêre û biçê bal wan ve. Lê hema dema ku tu di vî halî de bî, dê çima mirovên din werin bal te ve û dê çima li hember î vê bêtoleransî û nemusamehekariya te, bitolerans û bimusamehe bin?

Naxwe gereke her kes û her grûb li yên din ên ku gereke hevaltî û arîkariya wan bikin, bi musamehe û tolerans nêzîk bibin û bikin ku ev dîrî û ji hev cudabûn, ji holê rabe.

Ji ber vê yekê jî, me manşêta hejmarra xwe ya nehemîn kir "Yekitî fedakariyê dixwaze!"

### 10. Yê ku azadiyê nede dîgeran, ne layiqê azadiyê ye!

Îro di vê civaka em têde dijîn de mirov liqayî hinan têt ku evana ji xwe re azadiyê dixwazin, lêbelê ew bi xwe ne hazir in azadiyê bidin mirovên din. Hetta dev ji azadiyê jî biqere, evana ne hazir in heqê jiyînê jî bidin terefê miqabil.



Dema tu azadiyê bidî van cûr mirovan, weke tu gurê har ji zencîr berdî. Dema tu azadiyê bidî wan, ew ê pêşî azadiyê qir bikin. Naxwe, mirovên dogim, ne layiqê azadiyê ne.

Loma me manşêta hejmara xwe ya dehemîn kir “Yê ku azadiyê nede dîgeran, ne layiqê azadiyê ye!”

### 11. Îşxalkerê Quds a ezîz, Îsraîl dijminê me ye!

Weke ku hun zanin, piştî feşkilîna dewleta Sowyet a Sosyâlîst, Emerîqa dest bi îdfaya axatiya dinyayê kir û navê vê axatiyê jî kire “Nîzama Nû ya Cîhanî”. Û li gor vê axatiyê, ji heval û hogir û xulamên xwe xwest ku nêzîk î hevûdu bibin. Li gor vê xwestinê jî, vaye em dibînin ku hemû dewletên dûvik û xulamên Emerîqa ya mêtinker, nêzîk î hevûdu dibin. Gereke em bi hev nêzîkbûna Tirkîye û Îsraîl jî di vê çarçivê de bibînin.

Ji aliyê din ve, diyar e ku nêzîkbûna Tirkîye bi Îsraîl, ji her aliyan ve di eleyhê me kurdan de ye. Ji xwe berpirsiyarên

Tirkîye û Îsraîl jî vê yekê înkâr nakin û li her cihî îlan dikin ku dixwazin li hember “terorîstên” kurd û misliman, hevkarî û arîkariya hevûdu bikin.

Lêbelê em bêhêvî nînin. Lewra weke ku zalim, bira û dost û hogirên hev in, mazlûm jî bira û dost û hogirên hev in. Weke ku ew arîkariya hevûdu dikin, em ê jî arîkariya hevûdu bikin.

Naxwe beriya her tiştî lazim bû ku em vê hevkarîya Tirkîye û Îsraîl red bikin. Loma me di manşêta hejmara xwe ya yazdehemîn de wisa got: “Îşxalkerê Quds a ezîz, Îsraîl dijminê me ye!”

### 12. Saleke pir bi bereket!

Ên ku li hejmarên me yê derketî binihêrin jî wê vê heqîqetê teslîm bikin ku heqîqeten me saleke pir bi bereket li pişt xwe hişt û vaye me berê xwe daye saleke din î pir bi bereket.

Em bê hêvî nînin.

Lewra em: Dixwînin, dixwînin, dixwînin!

Lewra em: Destê hevûdu digrin, destê hevûdu digrin, destê hevûdu digrin! □

# FERMAN

Rîwayet dikin ku qumandarek bi nutqa xwe ya meşhûr  
'saet çend' gotiye di nexweşiyêke kûr de demekê  
di cihê xwe de hişk bûye paşê. Çi çare.

Jiyîna wî di qesrê de jî dibe ku  
tezahura qehreke muasir be  
ango ku tewatur. Lewra  
xayin î welat e qesir, îqtîdara wî de.  
Tikes negotiye, gelo ev çi hal e?  
ev çi du alîti ye? hemleke şikdar e? herkes  
bêdeng û sakit.

Ger kêzik û gêrik bane, dê kulîlk  
ew di guldanka tebîetê de teskîn bikrana  
Lê hema nebûye eslen li hember wî  
mîna wî paşayek an jeneralek.  
Lebelê çi çare. Zimên li hev pêçiyaye, bûye qelareşk  
bi xwe re biriye tiştê di kitêbê de  
bûye îlga.

Dîwar qeşa girtine di hin mezbeteyan de.  
Hasil î kalam! Paşa paşa sekiniye dile wî. Eslen  
negotiye ka az bavêjim nebza wî, carek din.

Gelo bi kîja zimanî ya "morte"?  
Bermalan de di odayên fireh de, "kurun"ê de, "kurultay"ê de,  
li ser sifra eraqê. Êdî  
nikariye bibêje, neye mirin neye; ferman. Çi çare.  
Qeşa girtine dîwar di mezbeteyan de. Çi çare.

Dev miçik û madamên rukuş behît mane.

**Nurettin Durman**  
**Ji tirkî: Hozan Oflaz**

# DI YEKSALIYA XWE DE NÛBIHAR Û ROLA WÊ

Ev hejmara me ya di destê we de, hejmara duwazdehemîn e. Em di her hejmara xwe ya borî de, li ser mijareke girîng sekinîn. Salek qediya. Helbete, di vê salê de kêmasiyên me bûne. Dibe ku tiştên me anîn zimên hinek kes jê memnûn nemabin. Mirov divê her cûr baweriyên xweş bibîne. Li gor min di nav salekê de me tiştên girîng anîn holê.

Dijminên kurdan yê tewr mezin sisê ne: Yek *nezanî*, yek *xizanî*, yek jî *ixtilaf* e. Em ê li ber van dijminan bi çekên *huner*, *zanîn* û *ittîfaqê* bisekinin. Ev tesbîtan yê Seîd Norsî ne û heştê sal berê hatine danîn. Lê îro jî ez dinêrim tesbîtên wê rojê hê jî rewac in. Nûbihar, di hejmarên xwe yê borî de li ser van pirsan jî pir sekinî.

Nûbihar kovareke kurdî û îslamî ye. Kovareke wisa cara pêşin li Tirkîyê derketiye. Ne tenê kovarên îslamî, kovarên din jî li Tirkîyê pir derneketine. Ji vê qasê çapemenî û weşaniya kurdî hê di wexta çarpîçûnê de ye. Em bi Nûbihar'ê dixwazin bi zimanê kurdî, bi navnasiyêke îslamî di her alî de orf û adetên kurdan pêşde bibin.

## Halê me kurdan

Zaliman bi sedsalan kurd ji hev cihê kirine. Welatê me parçe parçe kirine. Ev kêr dîtine, kurdan ji her heq û huqûqî jî mahrûm hiştine. Her çiqas kurdan îro jî ser xwe tirsê sedsalan avêtine û ji xewa

giran şiyarbûne jî, ji bo tevaya kurdan em nikarin vê îdeyê bimeşînin. Îro li Tirkîyê hê jî ti kurd nikare kovareke kurdî yan jî kovar û rojnamekê kurdan bê tirs bistîne û bi serbestî bi xwe re bigerîne. Pirên me kovar yan jî rojnameke wiha di nav tiştêkî de dinixûmînin, yanê vedîşêrin. Li Kurdistan'ê ev rewş hê zêdetir di jiyana me de cih girtiye. Lewra di welatê me de şertên pir giran hene.

Pir hevalên me newêrin bibin aboneyên kovaran. Em kovarê di zerfa girtî de ji hevalên xwe re dişînin. Kovara me, kovareke çandî ye. Tê de zêde nivîsên siyasî tinene. Dîsa jî kurd newêrin Nûbihar'ê bixwînin. Ev tişteke balkêş e. Çima kurd ditirsîn? Çima kurd li çand û huner û zimanê xwe xwedî dernakevin? Ma ne şerm e ku di welatekî de bi milyonan kurd hebin, lê kovar û rojnameyên wan zêdetir î 2-3 hezaran neyên firotin? Li ser kurdan şert e ku vê tirsê bê feyde ji ser xwe bavêjin û ji xewa teraliyê şiyar bibin. Encax wê wextê em bi navên xwe, bi cîsmê xwe bikaribin kêr î tiştêkî bînin. Erê rast e, herkes nikare li ber her zor û tadayiyê bisekine. Lewra kesin hene di şertên xwe de encax dikarin têkoşîna xwe bikin. Zarokên wan hene, di daîreke resmî de dişuxulin... Mirov dikare vê normal bibîne. Lê ji bo em jî di nav gelên dinyayê de xwe bidin nasîn û heqên xwe bixwazin, divê em di her mijarî de jî xwe îfade bikin.

## Astengên belavkirinê

Li ber me astengên girîng hebûn, hê jî hene. Xwendin û nivîsandina kurdî, piştî ku Cumhûriyeta Tirkî avabûye û vir de qedexe bûye. Di dewra Osmanîyan de jî kurdan bi besî li ser zimanê kurdî xebat û lêkolîn nekirine. Ji vê sebebê kurdî paş de maye, ji kurdan dûr ketiye. Helbete, ji wê wextê ve xebat çêbûna îro halê zimanê me wiha xirab nedibû. Diyar e ku xwendin û nivîsandina milleteke wisa ku ji zimanê xwe bi dûr ketiye, ne hêsan e.


Belavkirina Nûbihar'ê, li ber me asteng e. Kovara me li Kurdistan'ê bi tevayî belav nabe. Îro li Kurdistan'ê ceng heye. Li wê derê ti rojname û kovar bi besî belav nabin. Cihên ku kovara me were firotin jî, ev cîh in. Li her aliyên Kurdistan'ê jî Nûbihar belav nabe. Ji ber vê, tîraja me biqasî ku me dixwest, zêde nebû. Em neçin navçeyên Diyarbekir'ê, Cizîr'ê, Şirnex'ê, Nisêbîn'ê, Çolemerg û navçeyên wê û hwd, ma wê çawa tîraja me zêde bibe?

## Nûbihar heta niha çî kir?

Di nav salekê de ez bawer im ku me pir tiştên li feyda kurdan anîne zimên. Tiştê ku milletekî dike millet, berî her tiştî ziman e. Di vê dewrê de kî kelîmekê jî kurdî binivîsîne, ji zimanê kurdî û ji kurdan re xizmetekê dike. Ev bes e, ne bes e, mirov li ser vê behsê jî divê bisekine. Lê em kovareke mehane diweşînin. Helbete, şaxên têkoşînê fireh in. Em di van şaxan de encax dikarin yekê bînin

cih.

Me bi Nûbihar'ê nîşan da ku qasî ko bes nebe jî, misliman êdî li pirsra kurdî xwedî derdikevin. Bi rastî, di têkoşînên kurdan de, serokên serhildanan tev kesên dîndar in. Lê mixabin dîndarên ku li pey wan hatin, ew mîrasa wan ne domandine. Îro Nûbihar wê mîrasê didomîne. Em têkoşîna xelkê kurd heq dibînin. Lewra ji bil xapandin, qetlîam û birakûjiya bi destên sitemkaran, kurdan ti tişt nedîtine. Heqê kurdan e ku têkoşînê bidin û xwe ji bin zilmê xelas bikin.



## Nivîsana kurdî û nezan

Heta niha me ji pir kesî bihîstiye, dibêjin: "Ma nivîsa kurdî heye? Ma bi kurdî xwendin û nivîsandin dibe?" Ev gotin, gotinên kesên ji dinyayê bêxeber in. Lewra ev kesana ne xebatên zemanên borî, ne jî xebatên ku îro li ser zimanê kurdî dibin dizanin. Yanê ev kesana nezan in. Çapemenî û weşanên kurdî nîşan didin ku, bi kurdî jî

mirov dikare her cûr nivîsê binivîsîne.

Bi sayeta Nûbihar, pir kurd nivîsandin û xwendina kurdî hîn bûne. Vê rastiyê ne em dibêjin, xwendevanên me bi wesîleyên muxtelîf dibêjin. Xwendevanên me, ji me re nameyan dişînin û li ser nivîsandin û xwendina kurdî, rolên mezin didine Nûbihar'ê. Ev jî me pir kêfxweş dike.

Naxwe haydên, xuşk û birano!

Ji bo kovareke xweştir û bi naverokeke dewlemendtir dest bavêjin pênûsê. Em li benda nivîsên we ne. □

# NAMEYÊN BÊCEWAB/13

## 28 Berçile 1991

Ez çiqas deyndarê te me ey xapîn  
Vaye salek din dibihurê mîna xençer ji sînga min  
Diyareke windayî ye bihara umr, mewsim zivistan e cardin  
Li windabûnê mezin dibin di binê berfê de çiqil

Mîna kitêbeke xwendî dibihurê saleke din  
Mîna mar dikişê, dilê min de dewsa diranan jan dikê  
Sal li pişt xwe jehra zanînê dihêle û diçê  
Cardin tême avêtin ji cenneta bêhişiyê

Ma li min ketiye ez medha nezaniyê bikim  
Rahettir xew de diçe mahkûm ko derî tev girtî bin  
Ey zanîn, ey ava bi vexwarinê meriv tîtir dikê  
Ey mahkûmiyata ku bi vekirina deriyan ve naqedê

Ev çendîn û çend zivistan ey azadî  
Ev çendîn mayinistan jê dibihurim  
Daran de av ber bi jor ve dimeşê  
Bi ava jorê ye ku kulîlk mezin dibin

Naxwe tu pir bijî ey xapîn  
Pir bijî ey fitiloka riya nû  
Bila mêjiyê min de qamçiya zanînê biçeçê  
Bila rabê şahê êdî kehêla sor a zîhnê min

**Sabah Kara**

# ÇIRA VÊKETÎ, BIKIN MEŞALE

Ji bona kovarekê, salek demeke dirêj be... Lewra asteng û zoriyên li ber zimanê kurdî, nahêlin ku merev bi hêsanî karibe bixebite. Lêbelê cehda Nûbihar'ê ji van astengan bi hêztir derket û weşana xwe domand. Ji ber vê, em şikra Xwedê dikin û hêviya weşandineke berdewam dikin.

## Armanca Nûbihar

Nûbihar, ji bona bihurtina van rojên kambax, ji bona guhêrandina vê tevgera bikêrnehatî û ji bona rohnîkirina asoyên kurdan, xebatek şiyarkerî li dar xistiye.

Nûbihar, ji hejmarra yekem heta roja îro tim vê mesajê dide: Ko kurdan bi xwe, xwe neguhêrînin, ne Xwedê ne jî ti kesî din hîç wan naguhêrîne.

Lewra jiyana kurdan ji serî heta binî di pêwîstiya guhêrînê de ye. Ji bona ev guhêrandin were holê jî, divê ku kurdan 'guhêrandinê' bixwazin. Lewra heta ku xwestin tinebe, hêviya rizgariyê jî tineye. Pêxember ê me dibêje: "Ko du rojên yekî mîna hev bibihurin, ew di ziyane de ye." Lê mixabin, dev ji rojên wan berdin,

salên kurdan yekreng û monoton in.

Pêwîst e em êdî jana vê yekrengiyê di dilê xwe de his bikin. Pêwîst e em vê şundemayîna kambax, mîna janekê di dilê xwe de, di ruhê xwe de his bikin û em jê re bibêjin bes!

Vaye Nûbihar, ji bo vê hiskirinê, bûye dêstpêkek. Nûbihar mîna çirakê di vê şevreşê de vêket. Bi vêketina xwe, reşayiya şevê qelaşt û hêdî hêdî qelesa îrada zimanê kurdî da xebitandin.

Nûbihar, zemîneke wisa xubar amade dike ku bi vî awayî dixwaze hiş û qabiliyetên keç û xortên kurd ji talanbûnê, ji windabûnê biparêze. Dix-

waze asoyan li ber kurdan veke. Nûbihar bi vê eşqê, bi vê hesretê meşekê li dar xistiye. Ji bona bihareke nû, roj bi roj, hejmar bi hejmar xweştir û geştir dibe. Êdî bi zimanê kurdî helbest, nivîsar û çîrok tene nivîsandin. Nûbihar ji bona kurdan, mîna mektebekê, mîna dibîstanekê dixebite.

Ji ber ku heta îro nivîsandin û amojkariyek bingehî çênebûye, hemû unsûrên bipêşdebirinê ji nav kurdan windabûne. Pîr mixabin "bixwebawerî" ya kurdan jî



winda bûye. Loma gava li vî welatî rojname û kovarên kurdî derhatin, biqasî herkesî mirovên kurd jî lê şaş man. Bawer nedikirin ku bi zimanê kurdî karîbe bête nivîsandin? Lê hema vaye têtê nivîsandin. Hew em ahda avêtina vê tora ser mejiyê xwe bikin. Û berî herkesî, em bi xwe bawerbin ku em dikarin gelek xebatan bikin. Gereke êdî em bi zordestan û tiştên ku derbarê kurdan û zimanê kurdî de digotin, nema bawer bikin.

Gereke em bizanibin ku ji bona pêşiyên me li ser çand û amojkariya kurdan xebatên pir nekirine, em wisa ji her tiştî mahrûm mane.

Gereke em bizanibin ku li hemberî mekteb, zanîngeh, kitêb û amojkarên gelên din, eşîrtî, nezantî û bêxwedîtiya kurdan ji wan re bûne asteng. Medresên Kurdistan'ê hebûn lê mixabin kesên ku dixwestin bibin melê lê dixwendin. Di çavên xelkê de kesê ku nebe mele, ne hewcebû ku bixwîne. Ji hêla din jî, zimanê biyanî dibe ku mirovan hîn bike, lê ti carî netewekî nikare bi pêş de bixe.

Loma, dema ku ev rastî hate dîtin, gelek zana û rewşenbîrên kurd, ketin pêwîstiya vê mijarê û dest bi lêkirina dîwarên zimanê kurdî û çanda kurdî kirin. Lê hema ev xebatanan, heger bi bandûra zordestan be, heger ji bêhmkanîyan be, tim î tim nîvçe mane. Gerçi van dîwarên nîvçe, çanda kurdan bi tûmî ji windabûnê parastibin jî, mixabin bi awakî zexm nikarîne vê çandê geştir bikin û wê bi ser piyên wê xin. Lewra xebatên bûne ya

tenê di warekî de bûne, yan jî weke me li jor jî got, çend mirov tenê ji bona pêşdebirinê xebitîne.

Hal ev e ku, çand mîna golekê ye û gol, ji yekbûna çem û cihok û rubaran difire. Heger ava vê golê berdewam neyê tezekirin û qewetên nû neyên tevî vê golê nebin, hêviya temenekî dirêj ji vê golê nayê kirin û zû dereng ev gol wê ziwa bibe.

Loma çandek jî heger ji çarhawîr neyê avakirin û her nîfşên wê çandê, şop û eserên nû lê zêde nekin û çanda xwe geştir û spehîtir nekin, aqîbeta wê çandê tim î tim li binmayîn û jarbûn e. Ji ber ku aqîbeta çandek rewşxirab, aqîbeta milletê wê çandê ye jî, ew millet jî mahkûmê jarbûnê ye.



### Ev çira divê ku bibe meşalak

Nûbihar bi derhatina xwe dixwaze vî tiştî nîşan bide: Herçi heta vê rojê kurdan ji sazgeh û dibistan û medresan mahrûm mabin jî, ti carî nayê gotin ku wê her û her wisa bin. Nûbihar, ji

bo îspatkirina vê yekê jî, vaye hebûna xwe û gelek kovar û rojnameyên kurdî yên diweşin, nîşan dide.

Erê, êdî em ne bêhêvî ne. Lewra vaye dengên şiyarker bilind dibin. Xebatên ku tênekirin asoya me hêdî hêdî rohnî dîkin. Heger em bi can û dil xwe li vê rohnîyê bigrin, Xwedê bê erê em ê serfiraz bibin.

Naxwe, werin vê çira ku Nûbihar vêxistiye em wê bikin meşalake mezin û şeva xwe yî reş, pê rohnî bikin. □

# EV DINYA GEPEK NAN E

Bila te milkê cîhan  
Ji qaf bi qaf girtibe  
Bila malê alemê  
Tim milk û malê te be

Tu ser textê Sileyman  
Şadane rûniştibe  
Civata dîw û perî  
Emrberê emrê te be

Xezîneya Ferîdûn  
Xezîna Nûşîrewan  
Tim milk û malê Qarûn  
Ser ta ser milkê te be

Ev dinya gepek nan e  
Bê te girt û cûtiye  
Tiştê cûtî namîne  
Bê te tev de xwariye

Umrê te wek tîrek e  
Di kevan de şidî ye

Tîr şidayî namîne  
Bêje te avêtiye

Her nefesa ku te da  
Ji umrê te kêr dîke  
Wextê kîsik nivî bû  
Bê te tamam kiriye

Tu xerqî avê bûyî  
Avê da qirika te  
Weke dîna melerze  
Bê te fetisandiye

Umrê te di şadî jî  
Bihurtibe ey Yûnis  
Tim bi tim nefesek e  
Bê te xelas kiriye

**Yûnis Emre**  
**Ji tirkî: Hozan Oflaz**

## NUQURÇ/5

Mêro tu him nezan î, him nezan ku nezan î  
Tu xwe şêr qebûl dikî, lê ji rêza keran î  
Delîlê kerîtiya te, serhişkiya te ye  
Tu wek hemû serhişkan, dijê îlm û îz'an î

25 Hezîran 1993

**Mela Qasim**

# NÛBIHAR: ŞEREF Û RÛMETA MISLIMANAN

**B**i xêr û gunehên xwe Nûbihar sala xwe qedand. Em masûmiyetê nadin ti kes û muessesan, lêbelê ko gunehên Nûbihar'ê hebin jî pir hindik in. Lewra Nûbihar tîmsala hemiyetê ye, tîmsala îslamiyet û însaniyetê ye.

Lewra hemiyet, yanê fedakariya milî, li hemberî asteng û zehmetên dijwar û bi şiddet, sebr û metaneta qewî ye, li gora Seydayê Bedîuzzeman.

## Astengên ber Nûbihar

Astengên bi şiddet çibûn?

– Ji hedbihurtina saw û dijwariyên ku bi ser kurdan de hatine barandin.

– Embargo, asîmîle û qedexeya li ser dîrok, çand, orf, edebiyat û hemû hebûnên kurdan.

– Şewitandina mal û gundên mirovan û jî xerîtê xerakirina wan.

– Bêpîrs, birina mirovan û kuştina wan.

– Pîrbûna kuştinên failmeçhûl.

– Di warê çapemeniyê de, berhevkirin û girtina kovar û rojnaman, û bi sedema pirtûkan bi milyaran perecezakirina nivîskar û weşankarên wan.

Zêdekirina van astengan mumkin e. Lêbelê ne hewceye em van gişa binvîsin. Evana giş bêrûmetiyên dijmin in. Rûmeta herî mezin û muhîmtir ev e ku, di vê hengamê û li hemberî van astengên dijwar, derhatina Nûbihar'ê ye. Ev ne tişteke

rehet bû. Ji xeynî bikurdîderhatinê, bareke pir giran î din jî li milê xwe yê zêf kiribû. Ev bar jî, îslam bû.

## Girîngiya Nûbihar

Bê şik û şibhe, ev sed sal e ku, derxistina kovareke xwerû bi kurdî û îslamî, jî xeynî malbata Nûbihar'ê, nebû nesîb û şerefa kes î din.

Ne beriya Nûbihar, heger piştî derhatina wê jî, kovarek di şiklê Nûbihar'ê derhatiba, me yê wisa pesnê Nûbihar'ê nedabûna. Lê, dev ji derhatina kovareke bi vî şiklî berdîn, ti rîwayet jî di derheqê vî tiştî nehatine holê. Heger rewş wisa be, pesn û spasî heqê Nûbihar'ê ye.

Dibe ku hinek bibêjin; hun ewqasî pesnê xwe didin, ma bi derxistina kovarekê we çî bire serî? We dewletek damezrand, an we ev devlet felişand, ma we çî kir?

Em jî dibêjin: Na wele me ne dewletek damezrand û me ne ev dewlet felişand. Ev karên mezin bi derhatina kovarekê, bi qeweta rêxistin û cemaetekê bi tenê çêna-be. Ji bo van karana divê her kes têkeve binê vî bar î. Ko her kes bi hêlekê negire, ev meyt jî holê ranabe. Bi gulekê tenê bihar naye û em xwe di dêw eynê de jî nabînin. Em vê xusûsê pir baş dizanin.

Lêbelê cardin em baş dizanin ku, bi sembolekê jî be, di vê pirsgirêka mezin de me navê mislimanan jî anî holê. Li ser

navê xwe me di navbera mislimanan de ev perda kerr û koriyê çirand.

Sed sal berê bi kurdî, kovarek bi navê “Jîn” derdiket. Ev kovar di zemanê kin de omrê xwe temam kir. Bi vê kovarê jî ne dewleta mustebît ji holê rabû, ne jî Kurdistan damezirî.

Lê, di dîroka rojnamekerî û çapemenî û di şiyarkirina fikrê azadiyê de bû meşalake navemir.

Ez wisa bawerim ku, Nûbihar jî, di nava mislimanan de wezîfak wisa hilgirtîye û bi qeweta Xwedê wê bibe serî jî.

Nûbihar divê bête rexnekirin. Lêbelê rexnekirineke bi însaf divê. Rexnekirin divê ji bona çêbûn û pêşveçûnê be. Ne ji bona xerabî, paşdebirin û şewşikandinê be. Heger rexnekirin bi nêta duwemîn be, xwediyên rexnê ne samimî ne. Encax xayînên millet û dînê xwe dikarin vî karî bikin. Bê şik em ehlê hemiyetê ji xesletên jorê tenzîh dikin. Ewana layiqê her tiştên baş û xweşik in.

Em nabêjin ti kes nikare ji me bêhtir û çêtir vê xizmetê bike. Em dibêjin, tiştê ku ji destên me tên ev in. Meydan ji xwediyê hemiyetê re vekirîye. Kî ji bo vî karî dilşewat be û ji destê kê çî têt, bila bikin. Xwedê ji gişan razî be.

Me li jor jî got; hemiyet fedakariyê dixwaze. Bê fedakarî ti îş naçe serî. Bê şol û xebat jî ti qezenc nakeve dest. Carina ji hinek bira û hevalan dipirsim: “Tu Nûbihar’ê dixwîne?” Dibêjin: “Mixabin na, ez jê fêhm nakim, nikarim bixwînim.” Dipirsim: “Ji bo ku tu karibe bixwîne, tu hîç dixebite, te ji kesî zana

pirsî?” Dibêjin “Na.” Bila kes li qusûrê mêze neke, ewqas ecziyet û bêkêrî nabe! Dibe ku merev nizanibe bixwîne, ev ne eyb e. Lêbelê ji bo xwendinê jî divê merev piçkî bixebite. Lewra a eyb, nexebitandin e.

Ji bo hînbûna ingilîzî, erebî, farisî û hwd komek pere tên serfkirin û kes nabêje, “heyf” jî.

Lêbelê ji bo zimanê xwe yê maderzade merev vê qelsiyê bike eyb û şermek pir mezin e.

Ma hemiyet û fedakariya me kurdan nagihêje fedakariya xortekî ermen jî?

Mêrekî ermen, heger nizanibe bixwîne jî, sîrf ji bo beqaya kovar û rojnamên xwe dîsa bi pere li van hebûnên xwe xwedî derdikeve. Em ti milletî piçûk nabînin û tehqîr nakin. Lêbelê em misliman in û bi her tiştên xwe divê em li pêşiya dinyayê bin.

### Pêşniyara min

Li dawiya nivîsara xwe pêşniyareke min î mutewazî heye. Ji nerkesê ku hemiyet-

perwer û rewşa wî yî maddî jî dest dide, ricake min heye: Bila li dora xwe binhêrin û ji kesên ku qeweta wan î maddî tinebe 10 kesan, qe ne be, 5 kesan bi perên xwe abone î Nûbihar’ê bikin. Ev tişteke rehet û piçûk e, lê dawî û semera vî tiştî wê pir mezin be. Ya na, em ê musteheqê vê gotina Mela Qasim bibin:

“Mêro umrê te çûye bi teq teq û req reqê Tif rehmet nehesebîne, nebe weke beqê Xelq û alem jî heyvê li halê te dinhêrin Li ber cehaleta te merev dike biteqê”

□



# VILÎ ABYAY ÇIMAN DE MI DI

Bewranî qelban ra peray, eşq an qelbî terk kerdî... Vilî çilmiskyay, vilî merdeyê nika. Zerî zî sî. Ziwanî qisan dê raştan ra dûriyê.

Çoşmê dinyay di adiro vareno. Merdim yê soyinê pê anê, mezelê pê aşanênê.

Kurdistan' di qîrînî... însanî kişyenê, ala ci gunaya erd ro, qecî fişenga bindi benê gird, nanîrê hesret manenê. Helebçe di qeçê bêkesî, keynê şiyês serey, mayê kezebresî kişyay. Kamcîn millet hendayê qehr ant, hendayê bêçareya dinya di? "Qewmên da biqîmet hema bêwayir". (Bedîuz-zeman)

Bosna ra paletan dê tanka bin ra qîrçîna estana yena mi goş. "Ha ho" ya cinîyan resena azmînî, azmînî qelişnena. Hema dinya bêveng, dinya bêhes, dinya ker û lal...

Filistîn di çiman dê qeşandi qehr... Êstê gencan, goştana alawyeno. Zerî da mayan di çîka serhildanî... May qeçanê xwu kenê gird rişenê qiyam, rişenê merg... Mescîda Eqsa bermena, ewnena qiyamî ra, raya qeçan pawena.

Misir'di, Cezayîr'di zîndanana ra qîrîna însanana yena. Cinî qîrenê. Vanê "hey misliman biresi. Biresê hepsan birijnê ma ser. Mayê nika erdan dê Musaydi, pîze dê xwud pîncanê Fîrewnî kirêşenê. Ma qayil niyê jînbê. Ma qayil yê bimrê. Misliman tiyê kotîdi?" (Mektûbda çiniyê ki zîndanana dê Misirê dê)

Heme cadi zilm, qîrîn, kezalet. Însanê mehsûmî, hêsrê çiman. Beso, qelb qelişyeno, deyx nê-keno nê zilmî rê. No herbê mino, ê mino no serhildan. Zerî da mi di xur xura koyan, ez hezeyena, tepêşyena zelzelan.

"Rojhelat ti telli yê şiro ling da jew mislimanî, mislimanê rojhawanî ney xwudi nêanco, nêbeno mumîno kamil". Na he-dîs mi qedînena, mi

tersaynena. Cîhad, helbesta zerî da mi di. Şehadet dêra mina. Mi bêrî ya cîhadî kerdî. Çimandê mi di vilî abyenê, qelbê mi weşeno eşq ya. Ez nika ewnena rojî ra. Ez wariştan hewnî ra, zerya mi bieşq ya erzena. Tersê zalimana nika ez, zalima vero vinderda.

## HERBÊ MA

Teyyarey bimbay erzenê,  
Qeçê mehsumî kişyenê,  
Însanê mayê mirenê,  
May bermenê nê zulmî rê.

Gunya merdima rijyena,  
Qeçê ma fina warzenê,  
Bewranê pereno hewra  
Ma herbê xwu fina kenê.

Nê mend Dîn namus û welat,  
Ma rê kewno şew-roj xebat,  
Alem pêro ma paweno,  
Ray derga lazim o sebat.

Qur'ano yeno Kurdistan,  
Kurd yê hewadane destan.  
Ti jî warzi nê hewnîra.  
Yeno soyinê zaliman.

Muhammed Paşa

# BIRATIYA ME Û TIRKAN, BI ÎNKARA GEL DOM DIKE

**D**ema mirovên kurd bibêjin: “Tirkiye ya tirkan e. Ji Edirne heta Wan’ê yek welat e. Benda ku hatiye danîn ranabe, em tev tirk in, yan jî em kurd in, lêbelê em li tirkîyê dijin”; wê çaxê wê biratiya wan bête qebûlkin.

Wek mirovke mêvan ku bi emanet di xanîkî de rûnê û xwedyê xanî jî bibêje: “Bila xêra dê û bavê min be, tê de rûne.” Ev mêvan bibêje: “Ser çavan.” Wê çaxê ti dawe namîne. Lêbelê gava ku doza azadiya xwe bike, wê çaxê nexweşî tête holê. Her wekî helbestvanê kurd gotiye:

Gava dibêm Kurdistan, dibên nabe yekîtî / Înkâr bikim van kurdan, dibên xweş e biratî / Bêjim mafên bindestan, dibên te kir fitnetî / Gazî dikim ey cîhan, ma nebes e koletî

Biratiya me û tirkan bi tirkîti dom dike. Dema ku em bibêjin em kurd in, biratiyê qedexe dikin û dibên doza we nijadperistî ye. Wey wey, navê xwe li me dikin. Ev pêncsed û şêst sal in ku nijadperistiya wan li ser me ye û navê xwe li me datînin. Ey tirkên ku dibêjin doza me îslam e, werin însafê, ev nehsed sal in ku hun ji pişt Sed a Zilqerneyn hatine ser erdê romê. Lê vêya baş fam bikin, em ji wextê nebî Nûh de li vî welatî ne. Îsbata vê jî ku keştiya nebî Nûh li Cûdiyê, me sekinandiye. Vêya jibîr mekin û navê mêvantiyê li me nekin. Heger we dîroka xwe xwendibane we yê nas kiribane bê mêvan kî ne.

Vêya baş fam bikin, ola me îslam e, waletê me Kurdistan e. Ez dibêm birano,

ko doza we jî îslam be, werin em herin şerîetê. Lewra Xwedê Teala weha dibêje: “*Dema we li ser tişteki lec kir, wê (lecê) bibin cem Xwedê û qasidê Xwedê, heger baweriya we bi Xwedê û bi roja dawî (axretê) hebe.*” Û Xwedê di ayetek din de weha ferman dike: “*Herdu (Mûsa û Harûn) herin cem Fir’ewn û bibêjin, em qasidên rebbê alemê ne, benî îsrail bi me re bişîne...*”

Birayên delal, xebata rizgarkirina gelekî, ma çawa dibe nijadperistî? Ev tişt heger nijadperistî bûya -haşa-, Xwedê Teala emr î Mûsa û Harûn nedikir û nedigot gelê xwe ji bin zilmê azad bikin.

Heger ku hun bibêjin dewleteke cihê ne îslamî ye. Wê çaxê ka dewleta ometa îslamê rê me bidin. Heger hebûya û me jî dîsa bigota na, em ê ji ometa îslamê biqetin û dewletek cihê jî dixwazin, wê çaxê wê heqê we hebûya. Lêbelê niha tişteke wisa tineye. Ji azadiya ahbaz, çenanan re tu dibêje erê. Lê çima ji Kurdistan re tu dibêje na? Ma ev ‘na’ ya we, ne ji nijadperistiyê ye? Birayên delal, tête famkirin ku mislimanên we û rast û çepên we yekrikî dajon. Ew jî rika kêmkûrê zibikî ye. Ku dibêje ji Edirne heta Wan’ê... Em bi vê gotinê ne bawer in. Lewra em dîroka îslamê dinêrin, îslamê, Kurdistan ne kiriye Erebia. Hun bizanibin ku em ne bi we re bin wê yunan we ji ser axa romê derxe û hun ê şunde herin pişt Seda Zulqerneyn û nema zerara we digihêje me. □

# BÊÇARE

Tu sêrke kêzik bibîne  
Ku tariyê de dimîne  
Kî ku îbret jê negre  
Ew bi xwe re xaîn e

Bêçare kîja kes e  
Em ji wî bikin behsî  
Pišta xwe nade kesî  
Dibê hêza min bes e

Nemrûd bê jî total mêşê  
Fir'ewn bê jî mûristangê  
Çavhêşîn jî geber kir  
Ew mîkroba sîrozê

Qeyî bêçare ew in  
Ev rebenê bi xew in  
Eger ku heywan nebin  
Ew bê şîr û bê dew in

Ew ê ku got "ez" heme  
Xwe kir pût û senem e  
Îro di cehenemê de  
Para wan xwîn û xem e

Ew ê ku bêçare ye  
Her tişt ji wî re heye  
Wî tewekul kiriye  
Ti tirs jê re tine ye

Bi xeletî fam neke  
Bêçaretî ev yeke  
Li ber Rebbê Qadir de  
Ecza xwe nîşan bike

Ber evda nîşan ne de  
Ew mar e yê te ve de  
Wê mafê te tev bixwe  
Te re nahêle kede

Moza hingiv binhêre  
Ser her gulî digere  
Tariyê de namîne  
Ku bi rokê bawer e

Tu rast bibî bêçare  
Alem ji te re yar e  
Ew quwetek mezin e  
Ji te re nabe bar e

**Raîf Bêçare**

## PÊŞBAZÎ (Musabeqe)

Bi munasebeta yekemîn salvegera derketina kovara me Nûbihar, me pêş-baziyekê, yanê musabeqekê tertîb kiriye. Mijara vê pêşbaziye, "*Bikaranîna zimanê kurdî di weşanan û hemû aliyên jîyanê de, çi tasîrî ser kurdan dike?*" ye.

Gereke nivîsar bi zimanê kurdî bêtin nivisandin û ne zêdetirî sê (3) rûpelên daktîlo bin.

Em ê bi nivîskarê nivîsara ewil, 2.000.000 TL

Bi yê nivîsara duyem, 1.000.000 TL

Û bi yê nivîsara seyem jî, 500.000 TL pêşkêş bikin.

Digel vê, wê her sê nivîskar jî bi plakêtên pêşbaziye teltîf bibin.

Jûriya pêşbaziye, ji heyeta nivîskarên Nûbihar'ê teşkîl bûye.

Em li benda nivîsarên we ne.

**Nûbihar**

# NIHÊRTINA PÊXEMBER DE DÊ Û BAV

**D**înê îslamê gellek girîngî daye dê û bavan. Ji ber vê girîngiyê, bêyî destûra dayik û bavên misliman, zarokê wan nikarin derkevin cîhadê jî. Halviyaku, merteba cîhadê, xêrtir ji taeta şevan û rojîya rojan e.

Niha, ji jiyana Rêberê me derheqê vê mijarê de ez dixwazim bûyerekê pêşkêşî we bikim:

Ebdillah ê Amr kurê As rîwayet dike: Zilamek hate cem qasidê Xwedê û ji bona çûna cîhadê destûr xwest.

Qasidê Xwedê ferman kir:

— Dayik û bavê te li jiyane ne?

Got:

— Erê.

Qasidê Xwedê ferman kir:

— Wê çaxê li ba dê û bavê xwe cîhadê bike. Heger tu arîkariya wan bike, her wekî cîhadê ye.

Dîsa ji Hezretî Ebdillah rîwayetek din heye. Dibêje: Zilamekî hat bal Resûl ê Ekrem û jê re got:

— Ez ji bo bîetkirina te û ji bo razîkirina Xwedê, dixwazim ku hîcret û cîhadê bikim. Ji vê sedemê ez hatime bal te.

Qasidê Xwedê jê pirs kir:

— Ji dê û bavê te, yên li jiyane kes heye?

Wî zilamî got:

— Belê.

Rêberê me ferman kir.

— Wê çaxê vegere hinda dê û bavê xwe û ji wan re rindiyê bike.

Di rîwayetek din de, dîsa ji eynî kesî rê tete gotin: Zilamek hate cem Qasidê Xwedê û jê re got:

— Min diya xwe û bavê xwe di nav hêstirên çavan de hişt û ji bo bîetkirina te ez hatim. Pêxemberê me halo ferman kir:

— Vegere cem wan, te çawa ew bi girî vekirin here wisa jî kêfa wan bîne.

(Ev hersê hedîs ji hêla Îmam Muslîm hatine rîwayetkirin.)

Ji Ebû Sadî tê rîwayetkirin: Ji welatê Yemen'ê mirovek hîcret î cem pêxember kiribû. Qasidê Xwedê ji wî pirs kir:

— Li Yemen'ê kesekî te heye?

Wî zilamî got:

— Belê, dê û bavê min hene.

— Gelo wan destûr dane te?

Zilam got:

— Naxêr.

Pêxember heman wiha pêşniyarek li wî mirovî kir:

— Wê çaxê veger bal wan; destûra wan bixwaze. Heger destûr dan, tu jî cîhadê bike. Na, heger nedan, tu bi wan rindî û qencyê bike û dilê wan bistîne.

(Ev hedîs ji Ebû Dawûd hatiye rîwayetkirin.)

•••

Ez van hedîsana xelat û pêşkêşî wan kesan dikim ku xwe şareza û pêşverû (!) dihesibînin û xwe têkoşerên rêç û doza Xwedê nîşan didin, lê çî mixabin qedrê dê û bavên xwe nizanin. Bila zingînî ji guhê wan bê û pozê wan bişewite. □

# MA EV ÇAWA BIRATÎ YE?

**B**i qasî ku em dizanin, biratî; wekhev-  
bûna mirovan e ku yek xwedî çî he-  
qî be û çî heq jê re bikeve, lazime ku bi-  
rayê din jî eynen ji wî heqî îstîfade bike.  
Biratiyê de, ko mîrasek hebe, divê herdu  
bira biqasî hev jê îstîfade bikin.

Nuha em werin ser biratiya gelên kurd  
û tirk. Tirk dibêjin, "kurd birayên me ne,  
em wek hev in." Gelo rast e, yan tenê bi  
gotinê ye? Qasî ku em  
dibînin, hew bi zimên  
em bira ne. Wekî din,  
ti biratiya me û tirkan  
xuya nake.

Navê welêt, bi  
navê gelê tirk tê go-  
tin: "Tirkiye" Ku çî  
qencî, xurtî, camêrî,  
arîkariya mirovahî,  
zafer a leşkerî, bi kur-  
tî çî tiştê qencî û xwe-  
şî li vî welatî çêdibe, hemî dikeve kîsê tir-  
kan. Li bal gelên gerdûnê tê gotin, "Tir-  
kan weha arîkarî kir, weha qencî û xwe-  
şî kir." Herbek dibe 80 % gelê kurd dişî-  
nin, mirovên kurd dimrin, gelê tirk jî şan  
û şerefê qezenç dike. Wekî ku hinek bikin  
û hinek jî bixwin, ev xebat xebateke baş  
e. Kî ji vî karî heznake û dixwaze ku ev  
hala biqede? Kes bi hêsanî naxwaze. Ya  
duduya; zimanê resmî zimanê tirkî ye.  
Madem em bira ne, bila zimanê kurdî û  
zimanê tirkî tev resmî bin. Evqas xwen-  
degeh, radyo, televîzyon hemî bi zimanê  
tirkî ne. Ko rast em birane, ji bo çî zimanê  
kurdî di xwendegeh û radyo û televîz-  
yon û daîrê resmî de qedexe ye? Ko me-

riv ji gelê tirk re vê gotinê dike, dibêjin:  
"Ma çî ferq dike? Ziman ne meselake gir-  
rîng e. Ya girîng hev fehimkirina mirovan  
e. Xwedê ji bo pevşorkirina mirovan zi-  
man xuliqandiye." Madem ferq nake û  
dibêjin "ji bo ziman, vê dewletê parçe  
parçe mekin" û çîrokeke weha dibêjin:  
"Dijmin nanekî nikare bi carekê de bix-  
we, lakîn parçe parçe dike û dû re dixwe."



Erê; lêhema ma gelo  
di dîrokê de kîja we-  
lat, bi serbestiya zi-  
manan parçe parçe  
bûye? Dewletek aza-  
diya gelê xwe bide,  
qey ev dewleta parçe  
dibe? Na; hezar carî  
na! Meriv azadiya  
gelê xwe çiqas bide  
ewqas di nav gel de  
yekitî çêdibe. Em we-

kî tirkan ferz bikin ku ziman ne tiştek e.  
Heta nuha bi sed salan tirkî zimanê resmî  
ye, bila mirovên tirk, ko karibin, bila de-  
qekê weha xeyal bikin: Navê Tirkiyê,  
Kurdistan be, zimanê tirkî xwendegeh û  
radyo û televîzyonan de qedexe be û he-  
mî bi zimanê kurdî be. Gelo wê demê wê  
gelê tirk vî tiştî çawa bibîne û wê qebûl  
bike? Ma wê dîsa bibên ku "ziman çî ye,  
ma heta nuha her tişt bi zimanê tirkî bû?  
Bila îcar jî bi zimanê kurdî be." Gelê tirk  
kare bibêje "em bi zimanê kurdî niza-  
nin." Lêbelê bila gelê tirk zanibe ku kur-  
dan jî berê bi zimanê tirkî nizanî bûn û ni-  
ha jî gelek mirovên kurd bi zimanê tirkî  
nizanin. Vê meselê wê çawa bibînin? Ji

gelê kurd zêdetir wê biqeherin û wê berxwe bidin û bigrîn û bimeşin û şer bikin. Ko karibin wê dinyayê rakin ser piya. Wê bibêjin “qet tişteke weha nabe” ku tewr tişteki nikaribin hêrsbibin, biqeherin, biwerimin û bê teq û biteqin, yan jî bixerbilin û mest bibin. Lêbelê em naxwazin ku weha bibe. Em dixwazin bi aşî, rehetî û biratî ev tişt (ziman û hwd) azad bibin. Ko ser wicdanê xwe bibêjin û dengê wicdanê xwe guhdarî bikin li wî xeyalê ku me li jor qal kir, dîsa tehemul nakin. Naxwe ma em çawa bi sed salan di welatê xwe de li vî derdê tehemul dikin? De werin êdî hûn bifikirin!

Meriv di welatê xwe de êsîr be, huriyeta wî tinebe, nikaribe naveke kurdî li zarokê xwe ke. Navê welat û bajar û gund û merivan û hwd ku hezar hezar sal in ku ji bav û kalên me û bapîrên me de ji me re mane, hemî hatine guhertin û hatine qedexekirin. Vê zilma mezin ti kes nikare tehemul bike. Kurdan jî ji bo yekitiya îslamî, tim miliyeta xwe feda kirine. Tirk dibêjin “hezar sal in em tev in, hûn halo hûn, bila dîsa weha domke.” Ey gelê tirk her ku gelê kurd hişyar dibe, zilm girandibe, gelê kurd di bin vê zilmê de tête perçiqandin. Di navbeyna gelê kurd û tirk, ereb û faris de peywendî, bi rastiyê rabûye

û nemaye. Şûnê de elaqa axa û xulam çêbûye. Ji vê yekê, gelê cefakeş î kurd tehemul nake û serê xwe radike û dawa heqê xwe dike. Em jî dixwazin di daîra îslamê de, vê serxwebûnê bikin ku em nekevin koletiyên nuh de. Em dixwazin azad û serbixwe bin. Bila zarokên me bi çanda xwe û bê tirs mezin bibin. Bila stûxwar nebin. Bila gelê kurd jî azad bibe. Meriv çiqas azad be jî ebdê Xwedê ye. Madem em bira ne, yekî bi îman û xwedî wicdan bila biçe li bajar û gundên tirkan binihêre û were bajar û gundên kurdan jî binihêre. Wê demê wê bizanihe ku ev gotinên min bi kurtî û kêmasî ne. Lewra gundên tirkan ji bajarên kurdan xweştir in û xebat lê heye. Dema leşkerê tirkan tên Kurdistanê bi çavên mirovan li kurdan nanihêrin. Çi zilm ji destê wan were dikin û namûsa wan perkende dikin. Lêbelê dema meriveke merd derdikeve ber leşkerê wan, ewî xaîn îlan dikin û mirovên bêguneh dikujin, zilmê dikin û hem mukafatê, hem jî aferînê qezenc dikin.

Ev çawa biratî ye hevalno? Ev hebe nebe, êsirtî ye, koletî ye, bindestî ye!

Heger derewa nakin rast dibêjin em birane bila werin ku hûn zêde xwîna bira nerijiyaye, heqê bira çi ye, bila bidin. □

## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe ve ji hejmara [.....] pê ve min bikin aboneya/aboneyê kovara Nûbihar.

*Nav û paşnav:*

*Navnîşan:*

*Jimareyên hesabê ji bona razandina bedela abonetiye:*

*Li hundir:* Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

*Li derve:* Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100-3118770

Ji kerema xwe ve, Karta Abonatiye dagirin û tevli kopyeke pela razandina bedela abonetiye bişînin navnîşana me.

*Navnîşan:* Kızıtaşı Cad. Kuriş Apt. 51/3 Fatih-İstanbul Tel: 533 75 88 Faks: 524 00 38

*Bedela abonetiye: Li hundir: 180.000 TL. Li derve: 60 DM.*

## Ferhengok

<b>A</b>	ye arařtırıp incelemek	<b>Poz:</b> Burun
<b>Aqıbet:</b> Sonuç, netice		
<b>Asteng:</b> Engel	<b>J</b>	<b>Q</b>
<b>Ař:</b> Deęirmen	<b>Jar:</b> Fakir, zavallı	<b>Qaf:</b> Kaf daęı
<b>B</b>	<b>K</b>	<b>Qasid:</b> Elçi
<b>Balkêř:</b> Dikkat çekici, ilgi çekici	<b>Karpêk:</b> Eser, yapıt	<b>Qedr:</b> Kıymet, deęer
<b>Bask:</b> Kanat	<b>Kehêl:</b> Küheylan at	<b>Qelařtin:</b> Yarmak
<b>Bend:</b> Sınır	<b>Kevan:</b> Yay	<b>Qels:</b> İře yaramaz, sahte, çürük
<b>Beqa:</b> Ölümsüzlük, fani ol-mamak	<b>Kêzik:</b> Böcek	<b>Qerař:</b> Deęirmenci
<b>Berpê:</b> Tepki	<b>Kîsik:</b> Küçük kese, küçük torba	<b>R</b>
<b>Bes:</b> Yeter	<b>L</b>	<b>Radan:</b> Davranmak
<b>Biryar:</b> Karar	<b>Lec:</b> Kavga, münakařa, tartıřma	<b>Rewac:</b> Geçerli
<b>Bixwebawerî:</b> Özgüven	<b>Lêpîrsîn:</b> Soruřturma	<b>Rewřxîrab:</b> Kötü vaziyetli
<b>Bîetkirin:</b> Biat etmek	<b>Lidarxistin:</b> Kurmak, or-ganize etmek	<b>Rêç:</b> İz (yol)
<b>Borî:</b> Geçmiş		<b>Rukuř:</b> Rüküş
<b>C</b>	<b>M</b>	<b>S</b>
<b>Cehd:</b> Çaba	<b>Maf:</b> Hak	<b>Sakit:</b> Suskun
<b>Cûtin:</b> Çiğnemek	<b>Mayînistan:</b> Mayınlı saha	<b>Saw:</b> Terör, korku, dehřet
<b>Ç</b>	<b>Metanet:</b> Sakinlik, sükunet	<b>Sedem:</b> Sebep
<b>Çapemenî:</b> Matbuat, basın	<b>Mêtinker:</b> Emici, sömürge-ci	<b>ř</b>
<b>Çarpîçûn:</b> Emeklemek	<b>Mîçkirin:</b> (Özellikle gözü) Kapamak, yummak	<b>řadane:</b> Memnuncasına
<b>Çeqandin:</b> Çatlatmak	<b>Mijar:</b> Konu, mevzu	<b>řax:</b> Dal
<b>Çolemerg:</b> Hakkari ilinin gerçek ismi	<b>Mixab:</b> Mutsuz, üzüntülü	<b>řiyarker:</b> Uyarıcı
<b>D</b>	<b>Morte:</b> Ölüm	<b>T</b>
<b>Damîzrandin:</b> Tesis etmek, kurmak	<b>Muasir:</b> Çaędař	<b>Tîr:</b> Ok
<b>Dîbîstan:</b> İlkokul	<b>Mûristan:</b> Karınca yuvası	<b>Tîtir:</b> Daha susuz
<b>Diyar:</b> Somut, aşık, belli	<b>Mustebî:</b> Zorba	<b>Tor:</b> Ağ
<b>Dîw:</b> Dev	<b>N</b>	<b>V</b>
<b>Doqîk:</b> Topuzlu sopa	<b>Navçe:</b> İlçe, kaza	<b>Vêketin:</b> Yanmak, tutuř-mak
<b>Dunik:</b> Tırnak (" ") işareti	<b>Naverok:</b> İçindekiler	<b>W</b>
<b>E</b>	<b>Navnasî:</b> Kimlik	<b>Werimandin:</b> řişmek
<b>Emirber:</b> Emir alan, ast	<b>Nemaze:</b> Özellikle, bilhas-sa	<b>X</b>
<b>G</b>	<b>Nemirovane:</b> Gayri insani-ce	<b>Xerbilandin:</b> Solmak
<b>Gepek:</b> Bir lokma	<b>Nîř:</b> Nesil, soy	<b>Xerqbûn:</b> Batmak, boęul-mak
<b>Gîrîng:</b> Önemli, mühim	<b>Nixumandin:</b> Örtmek, giz-lemek	<b>Xeslet:</b> Özellik, haslet
<b>Guldank:</b> Vazo	<b>Nutq:</b> Söylev, nutuk	<b>Xubar:</b> Verimli
<b>H</b>	<b>P</b>	<b>Xulam:</b> Köle
<b>Halviyaku:</b> Halbuki	<b>Pesn:</b> Övgü	<b>Y</b>
<b>Hevgirtin:</b> İttifak, dayanıř-ma	<b>Pênûs:</b> Kalem	<b>Yadkirin:</b> Yad etmek
<b>Hinda:</b> Yanında	<b>Pêřniyar:</b> Öneri, teklif	<b>Z</b>
<b>Hûrnîhêrîn:</b> İnceden ince-	<b>Pêřverû:</b> İlerici	<b>Zînar:</b> Asla

# NEVEROKA SALA YEKEMÎN

## **ABDULLAH Naci**

- Rîsala biratiyê (2/21)

## **ACAR Hayrullah**

- Xizmetên giranbiha yên ku kurd ji ummeta îslamê re kirine (Wergêr ji Fehmî Şinnawî) (9/19)
- Nûbihar: Şeref û rûmeta mislimanan (12/18)

## **ADAY Nesimi**

- Bi romannivîsê kurdî Mehmed Uzun re hevpeyvîn (9/10)

## **AKGÛL Salih**

- Maqama duyem a peyiva sêzdem (Wergêr ji Bedûzzeman Seîd Norsî) (10/10)

## **AKÎF Mihemmed**

- Şeva mewlîdeke pir hezîn (1/28)

## **ALAN Mem ê**

- Şefeqet (3/17)

## **ALPER Abdullah**

- No mergê çendyo? (7/13)

## **AMED Sumeyye**

- Misliman bindest in (6/16)

## **AMED Zeyneb**

- Îslam û jin (7/18)

## **AMEDÎ Ebdillah**

- Daxwaz (2/26)
- Sedema "Pirsgirêka Kurdan" Emerîqa û rejimên dûvik in (5/20)
- Rûpelek ji exlaqê Pêxember (9/27)
- Nihêrtina Pêxember de dê û bav (12/23)

## **AMEDÎ Melek**

- Kargeha Hz. Zeyneb (3/16)

## **AMEDî Xelîl**

- Seîdan re (8/9)
- Pûtên bêxêr û bêkêr (8/27)
- Pêkeniyek ji Xocê Meşhûr (10/22)
- Pêxember û lepên şuxulker (11/29)

## **ARSLAN M. İhsan**

- Hevpeyvîn (1/11)
- Lêpîrsîn (4/12)

## **AVCI M. Said**

- Dimilî biwan, dimilî binûs (8/25)

## **AVDILLA Omer Saqî**

- Negrî heval (8/29)

## **AYDIN Abdullah**

- Rewşa me (8/12)
- Gazin (9/15)

## **AZAD M.**

- Çîroka ristî (Bi Sabah Kara re) (6/24)

## **BAGER**

- Serhildan (1/29)
- Îdo (2/20)
- Kî aşitî naxwaze (7/15)

## **BARAVÎ Raserîn**

- Lêpîrsîn (Wergêr ji Ismetullah Zahiroğlu) (6/10)
- Lêpîrsîn (Wergêr ji Metin Önal Mengüşoğlu) (8/22)

## **BAŞAR Hiseyn Elî**

- Fikir (10/18)

## **BAŞEĞMEZ Mahmut**

- Nûbihar ronîya çavê me ye (10/29)

## **BEDIRXANÎ Wedat**

- No kancîn dewr o (8/26)

**BEŞİRAN M. Kemaleddin**

- Leşkero şêr, brao delal (6/30)
- Ti zey ma nêbenê ma ya meyi (8/26)

**BEYHAN Ebdillah**

- Munafiq û yahûdî (6/6)

**BÊCIRMANÎ M. Nafî**

- Azadî (10/29)

**BÊÇARE Raîf**

- Pirsgirêka kurdan (6/9)
- Hevîdar (9/9)
- Ez ê bêbext (10/12)
- Xerîb (11/24)
- Bêçare (12/22)

**BOTÎ Serdar**

- Helkirina pirsgirêka kurdan (Wergêr ji Omer Kemal) (8/19)

**BOZKURT Fikri**

- Îslam û mesela qewmîyetê (10/25)
- Derdê giran (10/30)

**BURÛCERDÎ Zeyneb**

- Bixwîn! (3/20)

**CEWERÎ Firat**

- Lêpîrsîn (4/13)

**CIZÎRÎ Mela Ehmed**

- Newaya mutrib û çengî (1/22)
- Îsmê te ye mektûbî di dîwanî qidem da (2/12)
- Meşşateyî husna ezêl çengalî zulfan tabî da (3/11)
- Muxbeçeyên meyfiroş her seherê tên sema (4/10)
- Çîn çîn kirin zulfên siya kesk etlesa dîba qeba (5/31)

**CÛDÎ M. Îrşad**

- Rewşa kurmançî û zarokên kurd (9/25)

**ÇAMLİBEL Yılmaz**

- Lêpîrsîn (4/14)

**ÇELİKTEPE Mahmut**

- Wawîkê boyaxkîrî (3/18)
- Wê roj, bi ser me de derkeve! (5/8)

- Devxweşî û zikxezebî û boça rep (6/15)

**ÇETINKAPLAN Ömer Faruk**

- Nê hêsrî, hêsrê çimandê toyê dayê (5/30)
- Vilî çilmiskyenê (9/29)

**ÇEVİK Süleyman**

- Jiyanname û têkoşîna Bedîuzzeman Seîd Norsî (1/19)
- Xutba Xatirxwestinî ya Pêxember ê Ekrem (2/10)
- Nezanî bes e! (2/19)
- Pirsê kurdan îslam hel dîke (4/18)
- Ev şer, şereke hezar salî ye (5/9)
- Bedîuzzeman Seîd Norsî (6/21)
- Pênc hezar kulîlk (7/10)
- Roj, roja zanebûn û hînbûna bi zimanê xwe ye (8/7)
- Yekitiyeke çawa? (9/7)
- Azadî heqê herkesî ye (10/6)
- Dewleta Îsrâîl çawa ava bû? (11/9)
- Di yek saliya xwe de Nûbihar û rola wê (12/12)

**ÇİÇEK M. Rauf**

- Rêxistina Belavkirina Amojkarî û Weşanên Kurdî (10/16)

**DAĞHAN M. Diyaeddin**

- Strana me (Wergêr ji N. Fazıl Kısakürek) (5/19)
- Lez bike (10/27)

**DEMİRHAN M. Said**

- Ji bo zaliman bijî cehennem (10/28)

**DILGEŞ Felat**

- Sempozyoma Nûbihar: "Pirsê kurdî çawa çareser dibe?" (9/16)

**DOĞAN Ehmed**

- Bihara li zivistanê (6/11)

**DOĞAN Mihrican**

- Barê çaxekî li ser milê dayikan (5/13)
- Hz. Hewwa û gerdûn (8/28)

**DURMAN Nurettin**

- Ferman (12/11)

**EBDULLAH Ferhat**

- Welatek hawêrxweş (9/9)

**EKÎN Bedirxan**

- Nameyeke delal, ji xwendevaneke hêja (7/30)

**EMRE Giyaseddîn**

- Zilm ti car payedar nebûye (11/25)

**EMRE Yûnîs**

- Wer bibîn eşq bi min çî kir (2/14)
- Min canê cana peyda kir (3/15)
- Min umrê xwe li hîçê xerc kiriye (4/26)
- Nav xweşik û bi xwe xweşik Muhemmed (5/29)
- Têkeve riya rast dilo (6/18)
- Weke min î vî reben î (11/28)
- Ev دنیا gepek nan e (12/17)

**ETMANÎ Behram**

- Dua û niyeta rojya remezanê (5/29)

**EVÎNDAR Mafxwaz**

- Ciwanan re (6/10)
- Nalîn (10/27)

**EZEBAN Bedran**

- Lêpîrsîn (Wergêr ji Osman Tunç) (5/16)

**FINDIKÎ Seyid Elî**

- Li ser wefata Bediuzzaman Seîd Norsî (4/20)

**FIRAT Zafer**

- Bixwîn! (Wergêr ji Zeyneb Burûcerdî) (3/20)

**GORÛGAN Hemîd**

- Barana şadî (Bi Sabah Kara re) (3/24)

**GUNDÎ Seîd**

- Îslamiyet (10/14)

**GÛLMEZ Naci**

- Lêpîrsîn (Wergêr ji Mehmet Metiner) (5/18)
- Helebçe: Mirêka zalim û mazlûman (7/8)
- Ziman mohra qederê ye (8/17)
- Tiştê necîs bi bewla xenzîr neyê şuştin

(11/18)

**GÛNER Muhammed**

- Xelasiya kurdan bi îslamê ye (6/19)

**GÛR Fehmi**

- Rexne (5/19)

**HEQPEREST**

- Bi navê Yezdan (2/26)
- Hz. Omer dibêje (6/12)

**HESENÎ**

- Berxwedan (6/17)

**HEZROWÎ Mele Zahîd**

- Fexra ehlê îman, Seîd (10/9)

**HİKMET Nazîm**

- Keça piçûk (7/16)

**İNCE Vahedettin**

- Azadî (3/13)

**KARA Sabah**

- Ne zalim be, ne mazlûm! (1/5)
- Şerefa redkirina her tiştê ku mixalîfê azadiya me ye (1/17)
- Nameyên bêcewab/11 (1/27)
- Nezanî bindestî ye, zanîn rizgarî ye! (2/5)
- Korekorbûn, yan nebûn; ev e hemû pirsgirêk! (2/15)
- Nameyên bêcewab/1 (2/22)
- Ko zivistan çû, bihar têt (Bi Siyaweş Kîsrayî re) (2/24)
- Bibêje "Na!" (3/5)
- Nameyên bêcewab/2 (3/12)
- Barana Şadî (Bi Hemîd Gorûgan re) (3/24)
- "Pirsgirêka kurdan" (4/5)
- Nameyên bêcewab/3 (4/21)
- Hevpeyvîna rojnama Özgür Gündem (4/23)
- Lêpîrsîna heftenama Azadî (4/25)
- Pîtros (Bi Serwer Pûrya re) (4/28)
- Pirsgirêka Bosna: Zalim yek millet in, mazlûm yek millet! (5/4)
- Nameyên bêcewab/4 (5/14)
- Hevpeyvîna heftenama Azadî (5/23)
- Nameyên bêcewab/9 (6/4)

- Nameyên bêcewab/5 (6/14)
- Çiroka ristî (Bi M. Azad re) (6/24)
- Bila êdî tevkujiyên nû çênebin! (7/4)
- Mersiye ji bona zarokên ku li Helebçe hatin qetilkirin (7/4)
- Nameyên bêcewab/6 (7/20)
- Qendîla piçûk (Bi Xessan Kenfanî re) (7/23)
- Dar li ser kokê xwe hêşîn dibin, mirov li ser zimanê xwe! (8/5)
- Nameyên bêcewab/8 (8/18)
- Nameyên bêcewab/7 (9/4)
- Yekitî fedakariyê dixwaze! (9/5)
- Yê ku azadiyê nede dîgeran, ne layiqê azadiyê ye! (10/4)
- Nameyên bêcewab/10 (10/13)
- Îşxalkerê Quds a ezîz, Îsraîl dijminê me ye! (11/4)
- Nameyên bêcewab/12 (11/14)
- Saleke pir bi bereket (12/5)
- Nameyên bêcewab/13 (12/14)

#### **KARADENİZ AII**

- Qabiliyetên qurmiçî yan jî Helebçe (7/14)
- Azadî û ezperistî herdu li cîkî nabin (10/8)
- Di ayetên Qur'an'ê de yahûdî (11/15)
- Çira vêketî, bikin meşale (12/15)

#### **KEÇELİ AII**

- Rêzepirs (4/32)
- Rêzepirs (5/32)
- Rêzepirs (6/32)
- Rêzepirs (7/32)
- Rêzepirs (8/32)
- Rêzepirs (9/32)
- Rêzepirs (10/32)
- Rêzepirs (11/32)

#### **KEMAL Omer**

- Helkirina pirsgerêka kurdan (8/19)

#### **KENFANÎ Xessan**

- Qendîla piçûk (Bi Sabah Kara re) (7/23)

#### **KISAKÜREK N. Fazil**

- Strana me (5/19)

#### **KÎSRAYÎ Siyawêş**

- Ko zivistan çû, bihar têt (Bi Sabah Ka-

ra re) (2/24)

#### **KOÇER M. Şakir**

- Kovara Nûbihar (2/27)
- Medresa Horhor (7/16)
- Cindên Şêx Seîd (9/15)
- Çerxa felekê çep zîviriye (11/30)

#### **LA FONTAINE**

- Çirçirîk û mêrû (9/28)

#### **MELA QASIM**

- Nuqurç/1 (8/12)
- Nuqurç/2 (9/8)
- Nuqurç/3 (10/26)
- Nuqurç/4 (11/17)
- Nuqurç/5 (12/17)

#### **MELE EBDISEMED**

- Li ser wefata Bedîuzzeman Seîd Norsî (11/7)

#### **MELE HEMDÎ**

- Ka mislimantiya ku pêxember Muhemmed pê hatiye? (9/24)

#### **MEMITÎ Mistefa**

- **Ma ev çawa birati ye? (12/24)**

#### **MENGÜŞOĞLU M. ÖNAL**

- Lêpîrsîn (8/22)

#### **MERSABÎZADE**

- Milletek şîzofren (1/26)

#### **METİNER Mehmet**

- Lêpîrsîn (5/18)

#### **MIHACIR Aqil**

- Rewşa nuh û xortên me (9/20)

#### **MOLAZADE Î. Xelîl**

- Ma îslam zimanê kurdî bipaşde xist? (8/11)

#### **MÜFTÜOĞLU Atasoy**

- Lêpîrsîn (4/16)

#### **NORSÎ Bedîuzzeman Seîd**

- Ey geli kurdan! (1/16)
- Maqama duyem a peyiva sêzdem

(10/10)

### **NÛBIHAR**

- Di payîz de nûbihar! (1/3)
- Bi serokê Mazlum-Der M. Ihsan Arslan re hevpeyvîn (1/11)
- Peyivên rastan (1/15)
- Hejmara duyemîn (2/3)
- Peyivên rastan (2/23)
- Êdî ne wextê navê mustear e! (3/3)
- Hejmara çarem pîroz be! (4/3)
- Li zimanê xwe, li kovar û kitêbên xwe xwedî derkevin! (5/3)
- Îda Remazanê û Cejna Newrûzê pîroz bin! (6/3)
- Tevkujiya Helebçe jibîr nekin! (7/3)
- Îlel ebed bijî ey ziman şîrîn; îlel ebed bijî! (8/3)
- Hejmara nehemîn li me hemûyan pîroz be! (9/3)
- Gereke kurd nîşan bidin ku layiqê axaftin û xwendin û nivîsîna bi zimanê xwe ne! (10/3)
- Hejmara yazdehemîn bimbarek be! (11/3)
- Salek qediya (12/3)

### **OFLAZ Hozan**

- Şeva mewlîdeke pir hezîn (Wergêr ji Mihemed Akif) (1/28)
- Wer bibîn eşq bi min çi kir (Wergêr ji Yûnis Emre) (2/14)
- Min canê cana peyda kir (Wergêr ji Yûnis Emre) (3/15)
- Ez welatekî dixwazim (Wergêr ji Cahit Sıtkı Tarancı) (3/15)
- Hevpeyvîna rojnama Özgür Gündem (Wergêr ji Sabah Kara) (4/23)
- Lêpîrsîna heftenama Azadî (Wergêr ji Sabah Kara) (4/25)
- Min umrê xwe li hîçê xerc kiriye (Wergêr ji Yûnis Emre) (4/26)
- Hevpeyvîna heftenama Azadî (Wergêr ji Sabah Kara) (5/23)
- Nav xweşik û bi xwe xweşik Muhemmed (Wergêr ji Yûnis Emre) (5/29)
- Têkeve rîya rast dilo (Wergêr ji Yûnis Emrê) (6/18)
- Bixwaze çavê min giryan dike Dost (Wergêr ji Ummî Sînan) (6/18)
- Keça piçûk (Wergêr ji Nazım Hikmet)

(7/16)

- Helbestek ji lawikê ku ji feqîrtiya xwe fi-hêt dike (Wergêr ji İsmail Uyaroğlu) (11/26)
- Çermsoran (Wergêr ji Yalvaç Ural) (11/26)
- Weke min î vî reben î (Wergêr ji Yûnis Emre) (11/28)
- Ferman (Wergêr ji Nurettin Durman) (12/11)
- Ev dinya gepek nan e (Wergêr ji Yûnis Emre) (12/17)

### **OMERÎ Î.**

- Pîrozbahî (10/27)

### **PAŞA Muhemmed**

- Rîde tod, vilî abyenê (2/27)
- Raya ma (2/28)
- Qewetê îmanî (3/22)
- Qiyamê qelban (3/22)
- Ma tim bermay (4/27)
- Qelbê min dinyay rê beso! (5/30)
- Riyê xwu bisaw azmîn (9/29)
- Vilî abyay çiman de mi di (12/20)
- Herbê ma (12/20)

### **PINAR Abdullah**

- Sêwiyên ummetê (7/7)

### **POLAT Lokman**

- Di hêla dîrok, çand, edebiyat û zimanê kurdî de xebatên hêja (8/13)

### **PÛRYA Serwer**

- Pîtros (Bi Sabah Kara re) (4/28)

### **QISQANÎ Nacî Ebdillah**

- Durûtiya Rojava: Aspirîna Somalî bi xwîna Bosna bi me didine xwarin (5/11)

### **RİŞWANÎ M. Heqqî**

- Êdî ji xew rabin, razan bes e! (10/17)

### **SERKANÎ Bêkes**

- Zazakî watenî (6/30)

### **SEYDA Îrşad**

- Çirçirîk û mêrû (Wergêr ji La Fontaine) (9/28)

**SEYDAOĞLU Mehmet**

- Çend hedîsin ji Pêxember ê Ekrem (4/9)

**SÊWASÎ Ekrem**

- Ji Seîd Norsî re (9/21)

**ŞINNAWÎ Fehmî**

- Xizmetên giranbiha yên ku kurd ji ummeta îslamê re kirine (9/19)

**TEKÎN Ali Hikmet**

- Serfiraziya we, serfiraziya me ye (5/22)
- Birîna xedar (7/17)
- Ax me nedît rizgariyê (10/30)
- Gereke misliman li pirsê kurdî xwedî derkevin (11/27)

**TUNÇ Osman**

- Rojnama "Volkan" û "Cemiyata Îttîhadî Muhammedî" (1/24)
- Lêpîrsîn (5/16)

**ULU M. EÎ**

- Pêşveçûn, bi xwendin û desthevgirtin û xwe bi îslamê ve girêdanê ye (10/24)

**UMMÎ Sinan**

- Bixwaze çavê min giryan dike Dost (6/18)

**URAL Yalvaç**

- ÇermSORAN (11/26)

**UYAROĞLU İsmail**

- Helbestek ji lawikê ku ji feqîrtiya xwe fi-hêt dike (11/26)

**UYGAR Kamuran**

- Dengê mazlûman (6/15)

**UZUN Mehmed**

- Hevpeyvîn (9/10)

**WANÎ E. Remezan**

- Yekitiya mislimanan tirsê neyaran e! (6/7)
- Xwendin (6/20)

**XWEDÊPEREST**

- Nivîskaran û Seîd Kurdî (2/13)

- Bi helbestên kurdî dengê îslamê (7/27)
- Zimanê bêxwedî (8/10)

**YAŞA Gülten**

- Ax derdê azadiyê (6/23)

**YETİM Hamza**

- Îş bi çarixekê naqedel! (3/23)
- Çima hatim dinya fanî (11/19)

**YILDIZ Mustafa**

- Helebçe em te jibîr nakin (7/12)

**YILDIZ Şukrullah**

- Ferqa leşkerê romî û leşkerê sirb çi ye? (8/29)
- Biratiya me û tirkan, bi înkara gel dom dike (12/21)

**YÜCE Necip**

- Hey Melekent (2/28)

**YÜKSEL Asım**

- Axayê guhmezî (10/28)

**ZAHİROĞLU İsmetullah**

- Lêpîrsîn (6/10)

**ZELAL Azad**

- Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd (1/7)
- Çend hedîsin ji Pêxember ê Ekrem (1/9)
- Du qise ji jiyana Pêxember ê Ekrem (1/30)
- Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd (2/8)
- Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd (3/9)
- Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd (4/7)
- Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd (5/7)
- Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd (6/5)
- Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd (7/5)

**ZELAL Rojîn**

- Kovareke delalî kurdî: Nûdem (4/22)

**ZINAR Zeynelabidin**

- Pîrozname (5/12)
- Eî Herîrî (7/21)
- Mele Ehmed ê Bateyî (9/23)
- Mele Ehmed ê Cizîrî (10/19)
- Gulistana Bazîd'ê kovara Nûbihar'ê afirand (11/21)

**Weşanên me yên nû:**

**Nimêj Dikim**



*nûbihar*

**Bediüzzaman'ın  
Hayatı**

Abdurrahman Nursi



*nûbihar*

**Bediüzzaman'ın  
Volkan Yazıları**

Osman Resulan

**Video kasêtên sempozyoma me ya  
"Pirsa Kurdî Çawa Çareser Dibe?"**

**PIRSA  
KURDÎ  
ÇAWA  
ÇARESER  
DİBE?**

**1**

**PIRSA  
KURDÎ  
ÇAWA  
ÇARESER  
DİBE?**

**2**

**PIRSA  
KURDÎ  
ÇAWA  
ÇARESER  
DİBE?**

**3**

Her sê kasêt: 250.000 TL

NAVNIŞAN / ADRES

***nûbihar***

KIZTAŞI CAD. KURIŞ APT. NO: 51 / 3 FATİH - İST.  
TEL: 533 75 88 FAX: 524 00 38

